



Navnisan: Rue de Porto 132, 4020 Liège / BELGIQUE TEL: 003271318719 Email: info@kcdk-e.com

Wek **KOMÎTEYA TENDIRUSTIYÊ YA KCDK-E** ji bo ku gelê me di xweparastina ji virusa Korona(Covid-19) de bişopine, wek 3 qonaxan digrin dest û agahiyen ji we re parve dikan. Di vê mijarê de a herî girîng ev e ku, divê hun beyî xof, bi aqlê selim û bi piştgiriyeke civaki tevgerin e. Divê em ne bi tenê ji tendirustiya xwe berpirsyar bin, di heman demê de berpirsyarê tendirustiya mirovên din jî bibin û bi vê hişmendiyê tev bigerin. Divê bê zanîn ku li diji Koronayê(Covid-19) em wê bi hişmendiyekê civakî, bi piştgiri û bi têkoşineke hevpar serbikevin.

1. Pêşgiriyên li diji infeksiyona Covid 19'ê ku divê bê hildan ci ne?
2. Em dê çawa pergala jêbexiyê (immunität) xurt bikin?
3. Divê em dema xwe a ku bi gumana(şika) Koronayê(Covid-19) di qarantinayê de derbas dikan çawa tev bigerin?

#### **1. PÊŞGIRIYÊN LI DIJÎ İNFEKSIYONA COVID 19'Ê KU DIVÊ BÊN HILDAN CI NE?**

- Divê dest bi sabûnê heri kêm 20 saniyeya bê şuştin!
- Divê em destên xwe nedîn devê xwe, pozê xwe(Kep, difin) û çavên xwe!
- Divê nênikên dest û pêyan birêkûpêk bêrîn!
- Destikên deriyan, serşok û daşir (herweki din) hertim bêrîn paqijkirin!
- Divê di dema danûstandinê de ger ku gunçav e; dewsa pere, kart bêrîn karanin!
- Piştî danûstandinê, tiştên ku hatine kirin, beriya ku bixin hundir; divê teqez bêrîn paqijkirin!
- Qasî ku bikaribin divê wesayitên komguhêz neyên karanin. Ger ku bêrîn karanin jî beriya suwarbin û piştî daketinê dest bêrîn dezenfektekirin!
- Di navbera we û kesên din de 1-2 mitro(metre) dûrâtî hebe!
- Divê xurik teqez bêrîn paqijkirin!
- Divê pêjgeh û amûrên ku li pêjgehê têrî karanin pagij bê girtin. Herwiha xurik(zexire) û vexurik wekîri neyên hiştin!
- Kesên guman dikan ku di wan de şopên nexweşiyê hene, beriya ku biçin nexweşxaneyê; divê bi bijîşkên xwe yên malbatê re bikevin têkiliyê!
- Dema ku tekiliyeke we, bi kesên ku nexweşîya koronayê(Covid-19) hatî ditin, çê bûye; dive hun xebatkarên qada tendirustiyê agahdar bikin û rêgeza ku 14 rojan di qarantinayê de mayinê pêk bînin!
- Her pêşgiriyên ku hun hildidin, wê ji bo parastina me û yên derdorêne me giring dibe!
- Ger ku zarori nebe; divê dernekevin derive û bi kesên din re ji têkiliyên nêzik dûr bisekinin. Bi taybetî divê kesên ku di koma xeter de ne dernekevin derive. Divê bi wan kesan re piştgiri bê dayin û daxwazên wan bi cih bê anin!

## **2. EM DÊ ÇAWA PERGALA XWE A JÊBEXŞIYÊ(IMMUNITÄT) XURT BIKIN?**

- Pergala jêbexşiyê di heman demê de, pergala parastinê a ku me ji nexweşîyan diparêze, ye.
  - o Pergala jêbexşiyê bi tevi pergala laşî re bi koordineyi dixebite
  - o Ji xeyni xarin û vewarineke tendurist; xalêñ ku li jêr ji bo xurtbûna pergala jêbexşiyê pir giring in.;
    - Nekişandina cixareyê
    - Têriya xwe şilemeni(av,şorbe hwd) vexwarin.
    - Birêkûpêk kirina werzişê(spor hwd.),
    - Tendurist kilo standin,
    - Birêkûpêk razan(nivin, xewkirin).
- Ji bo ku berxwedaniya laş xurttir bikin ahengdariya vitaminin û berbesi(mineral) pir giring e.
- Ji ber ku hêk di xwe de; pir zêde protein, vitaminen weki A,D,E û B û herweki din berbesiyên(mineral) hesin, fosfor û çinko dihewine, divê di taştê de xwarina me a sereke bibe. Li gel wê yekê bi hêşinayıyên demsali, firêngi ku ji vitamina C'ye ve dewlemend e û isota heşin lê bê zêdekîrin.
- Ji bili van, xwarina firaqêke a ku ji mast û fêkiyên demsali li gel baçik(yûlaf) ji pêk tê, weki xwarin hilbijêrin.
- Di xwarinên nîvro û êvarê de yeksengiya hêşinayı(sebze) û proteinan berçav girtin, giring e.
- Divê masi, cureyên goştan û baqilan bi hêşinayı( sebze) bixeritînin, bixwin.
- Di nava rojê de misteke gûz, bahiv û hwd. bê xwarin; him ji bo ku enerji standinê, him ji ji bo pêşwazikirina hewcedariya me a bi berbesi(mineral) û vitaminen din, giring e.
- Di nava rojê de heri kêm ji 2 litre vexwarina avê re giringi bê dayin.
- Mirov dikare bi hildana vitamina C û çinkoyê pergala xwe ya jêbexşiyê xurt bike. Vitaminin û berbesi( minarel) piştî serlêdana bijîşkên xwe yên malbatê dikarin bê standin.
- Ji ber ku bi tenê xwarina tiştan hewcedariya laş a vitamina D nayê pêşwazikirin, divê dem dem asta vitamina D bê pivandin. Ger ku hewce bike bi awayeke din bê standin.
- Vitamina E him ji bo xurtbûna pergala jêbexşiyê; him ji li diji pêsivê(serma û cemidandin) berxwedariya laş xurttir dike. Xurikên wek bindiq(findok) û gûz ne bi tenê ji aliyê rûn(zeût) ve di heman demê de ji aliyê vitamina E ji dewlemendin.
- Divê mast û kefir ku ji aliyê probiotik ve dewlemend in,bê tercihkîrin. Rûviyeke ji aliyê probiotik xurt, herwiha ji pergala jêbexşiyê re ji alikar e.
- Di nava rojê de vexwarina çaya hejin, giyagewrik û ixlamûrê baş e.

### **3. DI DEMA MAYINA QARANTINAYE DE KU BI GUMANA(SIKA) VİRUSA KORONAYE, DIVÈ ÇI BÊ KIRIN?**

Di vê serdema ku vírusa korona( Covid 19)pir bi hêz belav dibe de, divê kesên difikirin ku di xwe de nexweşiyê dihewînin; 14 rojan li malê bisekinin! Gelo divê mirov di vê pêvajoyê de çi bixwe û vexwe? Divê bala xwe bide çi?

- Tiştên ku di vê nivisê de, ne bi fikreke ku bitaybeti ji bo ku li dijî vírusa koronayê(Covid-19) baş e, hatiye nivisandin; berovajî her xwarin û vexwarin ji çarçoveya xweyibûneke tendurist hatiye pêkanin.
- Di pêvajoya qarantinayê de tiştên ku ji aliyê kesan ve divê rojane bê xwarin û pivana wan wisa ne:
  - o 2 litre tiştên vexwarinê
  - o Nan, kartol û makirne :350 gr.
  - o Heşini(Sebze) û baqliyê :400 gr
  - o Fêki û bindok, gûz , bahiv(bahiv)
  - o Şir û tiştên ku ji şir hati hilberandin(çekirin) :250 gr.
  - o Masi, goşt û hêk :150 gr
  - o Cureyên rûnan(zeyt) :40 gr
- Dema ku pozê mirov(difin,kep) xitimî be, dive poz(difin,kep) bi spreyen ji ava behrê pêk ten û her wiha bi serûmên fizyolojik bê paqij kirin.
- Divê rojane ser bê şûştin û kine(cil û berg) bên guherandin( degiškirin).
- Rûyê lihêf û balgehan divê rojane bê şûştin.
- Divê xani ode(mezel) hwd. bên hewadarkirin.
- Dive dem dem dest bi sabûnê bê şûştin, ger ku sabûn ninbe divê dezenfektan bê karanin.

Di pêvajoya qatantinayê de dibe ku giliya bêhali û bêmedeyi pêş bîkeve. Ji vê sedemê xwarineke hêsanibar(pratik) wê bi girîng bibe. Herwiha divê qası ku bikarîbin di vê pêvajoyê de danûstandinê kêm bikin û tiştên xwarinê li gor vê yekê kar binin.

Kesên ku nexweşi, aciziyekî cuda û hewceyi perhizeki(diyet,parêz) cuda nîn in;

- Şir û tiştên ku ji şir hati hilberandin.
- Hêk,
- Gûz,bahiv(badem)bindog(findok), dehn,baçık(yûlaf)
- Heşini[Sebze]; şoqil,polik(bezelye),ispenax(siyale,silqok) û nok û nisk; ger ku hebe nû(taze), ger ku nîn be ji weki konservekirî bê xwarin.
- Wek fêki divê sêv û narinciye bên xwarin.